PIRTÛKEKE MATEMATÎKÊ YA BI KURDÎ JI NAV WEŞANÊN ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ DERÇÛ.



Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê
Navnîşan: Huzurevleri Mh. Kalem Sk. No: 32 Kat: 4
Tlf / Faks: 0412 237 43 16
e-mail: enstituamed@hotmail.com

A- ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ Û PIRTÛKA MATEMATÎKÊ

Xwendevanên hêja;

Wek Enstîtuya Kurdî ya Amedê heta niha em bi piranî bi berhemên wêjeyî û çandî derketin pêşberî we. Lê em dizanin saziyeke ku navê wê Enstîtuya Kurdî be her çiqas giraniyê bide berhemên wêjeyî û çandî jî karê wê tenê ne ev e. Divê di gelek qadan de bixebite û ji bo afirandina lîteratura kurdî ya di her qada zanistî û ramyarî de hewl bide.

Rêzdar Hesen GUNEYLÎ di encama xebateke demdirêj de ev berhem afirandiye. Di vê berhemê de hinek xalên sereke yên Matematîkê bi kurdî hatine ravekirin. Ev destpêkeke hînbûna matematîkê ya bi kurdî ye. Hinek mijarên sereke û têgihên matematîkî di berhemê de cih digirin. Ji ber ku destpêk e mijar bi berfirehî û kitekit negirtiye dest. Lê em bawer in ji bo pêşketina lîteratura matematîkê di kurdî de dê roleke girîng bilîze. Hinek mijarên sereke yên ku di vê berhemê de cih negirtine jî dê di çapa duyem an jî cîlda duyem de cih bigirin. Em hêvîdar in em ê wan jî bigihînin ber destên we. Jixwe nivîskar xebatên xwe bênavber didomîne û hewl dide ku ji tevahiya berhemên matematîkê yên ku heta niha hatine amadekirin jî sûdê werbigire. Her çiqas zêde dixwest jî berhemên ku li Başûr hatine amadekirin negihîştin ber destên wî.

Di dawiya pirtûkê de ferhenga kurdî–tirkî–îngilîzî ya têgihên ku hatine bikaranîn cih digire. Di navlêkirinan de bi piranî ji ferheng û berhemên heyî sûd hatiye wergirtin. Kesên ku ji bo van navlêkirinan xwediyê ramanên cuda bin ku nêrînên xwe bi me û nivîskar re par ve bikin em ê kêfxweş bibin. Hûn dikarin ji malpera bi navê www.matematikakurdi.com û Enstîtuya Kurdî ya Amedê re van dîtinên xwe ragihînin. Ev berhem ji bo me di heman demê de destpêka pêvajoya nîqaşa têgihên matematîkî ye jî.

Xwendevan û xebatkarên zimanê kurdî yên hêja;

Wek ku me li jorê jî got heta niha me giraniya xwe da xebatên çand û wêjeyî. Lê ziman bi tenê di qada çand û wêjeyê de nayê bikaranîn di her qada jiyanê de tê bikaranîn. Ji ber vê yekê pêşketina ziman tenê bi qada çand û wêjeyî ve ne girêdayî ye. Di heman demê de bi qada zanistî ve jî girêdayî ye. Ji ber vê yekê digel xebatên çandî û wêjeyî bi qasî hêza xwe em ê giraniya xwe bidin xebatên zanistî yên wek matematîk, fîzîk, kîmya, biyolojî û hwd. Kesên ku dixwazin di van qadan de bixebitin an jî dixebitin û berhemên amadebûyî li ber destên wan hene û dixwazin xebatên xwe bigihînin xwendevan û xebatkarên zimanê kurdî dikarin van xebatên xwe bi me re par ve bikin. Çi ji destê me bê em ê ji bo van xebatan bikin.

Bi hêviya amadekirin û ragihandina gelek berhemên bi vî rengî, bimînin di xweşiyê de.

Enstîtuya Kurdî ya Amedê

B- KUNYEYA PIRTÛKA MATEMATÎKÊ

Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê: 16
Zanist: 1
Navê pirtûkê: Matematîk
Nivîskar: Hesen GUNEYLÎ
Redaksiyon: Serwet DENÎZ - Semra OZBEY
Berg û Rûpelsazî: Azad ZAL
Çapa Yekemîn: Avrêl 2009
Çapxane: Berdan Matbaası
ISBN: 978-975-01719-5-6
Ebat: 160 x 230 mm
Rûpel: 80 rûpel
Tîraj: 1000
Buha: 8.00 TL

C- TÊKILÎ

ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

EDUBBA Sosyal Bilim Bilgi İletişim Merkezi Basın Yayın Reklamcılık Eğitim Sanayi Ve Ticaret Limited Şirketi

Navnîşan: Huzurevleri Kalem Sokak No: 32
Kayapınar / DİYARBAKIR
Tlf/Faks: (0 412) 237 43 16

e-mail: enstituamed@hotmail.com